## Hûn  me li ku karin bibînin?

Li vir hûn ê me li qada veguhestinê bibînin.  Ger pirsên we hebin, ji kerema xwe bi me re têkilî daynin(Şêwirmendiya Pêvajoya Penaberiyê ya Diakonî - Cilên kesik).

## Ez dikarim ji kê din re bi ba-werî çîroka xwe bînim ziman?

Ji bo vê yekê, bi xebatkarên şêwirmendiya psîkososyal û şêwirmendiya pêvajoya penaberiyê ya li cihê xwe re têkilî daynin.

## Têbînîyên min:

________________________________________

________________________________________

________________________________________

________________________________________

________________________________________

Hûn dikarin di berhevoka me ya girêdanên ji bo penaxwazan de bêtir agahdariyan bi-bînin (berdewamî tê nûve kirin):

SCAN ME


Innere Mission
Diakonisches Werk Bochum e.V.
Fachdienst-Migration und Flucht
Asylverfahrensberatung in der
Landeserstaufnahmeeinrichtung
(LEA) NRW, Bochum
www.diakonie-ruhr.de


Diakonie Ruhr


Gefördert durch:

Bundesministerium des Innern

aufgrund eines Beschlusses des Deutschen Bundestages


Diakonie Ruhr

# Qelsbûn/ Bêhêzî di pêvajoya penaberiyê de

Kurdisch Kurmanci




Flyer Vulnerabilität im Asylverfahren 2024-09-25 Kurdisch Kumanci.indd 1 26.09.24 08:14

## Bêhêzbûn di pêvajoya penaberiyê de tê çi wateyê?


Li gorî Destûrnameya Pejirandinê ya Xala 21'ê, kesên jêrîn, di nav yên din de, ji koma bêhêzin in:

- biçûkên bêkes (UM),
- kesên pîr
- Kesên astengdar yên Xwedî hewcedarîyên Taybet
- Jinên ducanî (avis)
- Dê yan bav, ku bi zarokên xwe yen biçûk re di jî
- mexdûrên bazirganiya mirovan
- Kesên bi nexweşiyên giran
- Kesên xwedî pirsgirêk (nexweşiyên psîkolojîk)
- Kesên ku rastî îşkence, destavêtin an jî jorên din ên giran hatine psîkolojîk, fîzîkî an tûjî şîdeta zayendî bûne.

Bi ser de, komên din ên mirovan hene ku bi taybetî hewcedariya wan bi parastinê heye, wek mînak, kesên ku ji ber meyla xwe ya zayendî hatine çewisandin an kesên ku nexwendewar in.

## Çima girîng e ku meriv behsa qelsiya xwe bike?

Girîng e ku hûn hişmendiya bêhêziya xwe bilind bikin -behs bikin- da ku hûn piştgiriya ku hûn hewce ne bistînin, mînak: di pêvajoya penaberiyê de, li rûniştgehê an jî di lênerîna bijîşkî de.



## Divê ez kengî behsa qelsiya xwe bikim?

Di dema qeydkirinê de, lê herî dereng li cihê ku hûn lê dimînin, divê hûn di şêwirdariya pêvajoya penaberiyê de balê bikşînin ser lawaziya xwe. Şêwirdarî di hawîrdorek profesyonel, bawerane û ewledar de pêk tê.

## Ma normal e ku meriv ji vegotina çîroka xwe dilgiran û nebawer be?

Erê, bi tevahî tê fêm kirin ku hûn gava dilê xwe ji xerîbek re bi tevahî re vedikin, dilteng û bêbawer hîs dikin. Lê xem nake, kesê pêwendiya we di şêwra pêvajoya penaberiyê de di vî warî de perwerdekirî ye, dê piştgiriyê bide we û çîroka we bi nepenî -bawerane- bi rê ve bibe.

## Ez çi piştgiriyê karim bistînim?

Hûn ê di çarçoveya pêvajoya penaberiyê û ji navendên şêwirmendiyê yên pispor de alîkariya minasib karin bistînin. Navendên şêwirmendiyê hene ku di warên kesane de pispor bûne. Ji kerema xwe bi dilxwazî bi me re bipeyivin an bi kesê pêwendar re li cihê rûniştina xwe têkilî daynin.

Diakonie Ruhr